Müslümanlar Ortadoğuyu fethettikleri zaman, dünyanın belli başlı uygarlık merkezleri olan şehirleri de zapt etmişlerdi. Bu şehirlerin en önde gelenleri şunlardı; İskenderiye (Mısır), Antakya, Şam, Rakka, Samsat, Karrae (Harran), Nisibis (Nusaybin), Arbela (Erbil), Sitesifon (Şimdiki Bağdat'ın kuzeyinde Part ve Sasani İmparatorluklarına başkentlik yapmış, Müslümanların Medain dedikleri şehir), Amida (Diyarbakır), Gundişapur (Cundişapur-Güney batı İranda antik bir şehir). Bütün bu şehirlerin ortak özelliği, Roma- Helen (Eski Yunan) uygarlığı ile Mezopotamya uygarlığının sentezini yapan başlıca merkezler olmalarıdır. O çağda bu şehirlerde yaşayan ilim adamları, ortaçağın en büyük medeniyeti olan İslam uygarlığının kurulmasında birinci dereceden rol oynamışlardı.

Orda çağda Samsat, Karrae (Harran), Amida (Diyarbakır), Nisibis (Nusaybin), Arbela (Erbil) şehirleri yoğun olarak Kürt nüfusu barındırıyorlardı. Adı geçen bu şehirlerde ve Kürdistan'ın başka yerlerinde yaşayan Kürt ilim adamları, İslam uygarlığının gelişip güçlenmesinde, büyük katkılar sunmuşlardır.

Bu Kürt âlimlerin başlıcaları, Ebu Hanife Ahmet Dinavveri; 850 ile 896 yılları arasında yaşamış Ebu Hanife çok yönlü bir ilim adamı idi. Avrupalılarca Arap rakamları denilen, Arapların ise Hint rakamları dedikleri ve günümüzde bütün dünyanın kullandığı rakamları ve sıfırı işlevsel hale getiren âlim, Ebu Hanife Ahmet Dinavveri'dir. "Böylece Ebu Hanife birinci sınıf bir matematikçi, gökbilimci ve sanayi mühendisi olduğu kadar, aynı zamanda bir bitki bilimci, zoolog, tarihçi, coğrafyacı, filolog, edebiyat eleştirmeni ve etnografyacıdır da" (Kürtler-prof. M.İzady). Ayrıca ortaçağ İslam'ının önde gelen ilim adamları arasında; Ebul Fida, İbnul Esir, İbni Şeddad ve İbni Quteybe gibi tarihçiler, El Suhreverdi ve Aynel Qudat El Hemedani gibi filozoflar, İbni Fadlan, İbni Yakut gibi coğrafyacı ve gezginlerdir. Bundan başka Safi El-Din Urmevi ve Muhammed İbn-i Katip Erbili gibi müzikologlar İbrahim Mevsili, İshak Mevsili, Zeriyap Cizrevi gibi müzisyenler Arap ve İslam müziğinin gelişip evrenselleşmesinde birinci derecede rol oynamışlardı.

Meşhur Abbasi halifesi Harun el Reşid'in çağdaşları olan bu müzisyenler halife Harun Reşid'in emir ve desteği ile müzik akademileri kurmuş, klasik Arap müziğinin temellerini atmışlardır. Bu müzisyenler günümüzde kullanılan doğu kökenli bir çok müzik enstrümanın ya icat etmişler ya da geliştirmişlerdir. Bu müzisyenlerden Zeriyap Cizrevi Endülüs Emevi halifesi Abdurrahman'ın daveti üzerine Bağdat'tan Endülüs'e (İspanya) gitmiş gitarı icat etmiş ve klasik Endülüs-Arap müziğinin temellerini atmış ve geliştirmiştir. Hatta günümüzde modern İspanyollar bile müziklerinin kurucusunun Zeriyap olduğunu söylerler..

Yine ortaçağın en büyük tarihçi ve biyografi yazarlarından olan, kendisi Rişvan aşiretinin xellikan (Hallikan) boyuna mensup İbni xellikan (Hellikan). dünyada ilk robotu yapan ve İngiliz bilim dergisi Nature tarafından sibernetik (otomatik makinalar bilimi) biliminin kurucusu olarak kabul edilen^ Bediuzzaman İsmail el Ciziri, ortaçağın en önemli mimar ve mühendislerinden olan El Munis, matematikçi ve gökbilimci Muhiyeddin el Axlati (Ahlati), İbn-i Nedim gibi ansiklopedistlerdir.

ALEVİLİK İNANCI VE KÜLTÜRÜ

Hz. Muhammed'in vefatından sonra Müslümanlar arasındaki iktidar kavgası büyüdü. Bu iktidar kavgası Aleviliğin ortaya çıkışının zeminini hazırladı. Hz. Ali, Hz. Muhammed'in amcasının oğlu ve damadıdır. Aleviler,Hz Ali'nin,Hz. Muhammed'in damadı olmasından 1.halifeliğinde onda olması gerektiğini söylerler.Tabi süreç böyle gelişmedi.Önce Ebubekir sonra Ömer ve Osman ile devam eden halifelik makamı Osman'dan sonra halife olan Hz. Ali'nin halifeliğine muhalefet eden Muaviye, Hz Ali'ye karşı muhalefetini şiddetlendirdi. Önce Hz Ali katledilerek tasfiye edildi. Hz Ali'nin yerine halife olması icap eden oğlu Hz Hasan ile halifeliğin sıra ile yürütülmesi anlaşmasına uymayan Muaviye bir entrika ile Hz Hasan'ı ortadan kaldırdı. Halife olma sırası Hz. Ali'nin diğer oğlu Hz. Hüseyin'e gelmişti .Muaviye, Kerbela vakası olarak bildiğimiz katliamla Hz Hüseyin ve bütün ailesini katlederek, bütün muhalefeti ortadan kaldırdı. Bu olaylar tarihe, bir hakkın gaspı olarak geçer. Hz Muhammed'in ailesine karşı yapılanın tarihi bir hata olduğu kabul edilir. Olaylar bölge halklarını, yeni dini ve felsefi ayrışmalara götürdü.

Ebubekir, Ömer ve Osman dönemleri İslamiyeti Ortadoğu'da yerleşmeye başlandığı, dönemlerdir. Ortadoğu'da yerleşik halklar, sahip oldukları inançlarından kolayca vazgeçip İslam dinini gönül rızaları ile kabul etmediler. İslam dinini kabul edilmesi için bölge halkları üzerinde zulüm uygulandığı tarihi anlatımlardan bilmekteyiz.

İktidar mücadelesinde mağlup olan Hz. Ali'nin ailesi ve taraftarları ile Emevi iktidarında mağdur olan halklar arasında bir gönül birliği, beraberliği oluştu. Ortadoğu'nun bazı halkları Hz. Ali'nin İslam'a olan inancını, kabul etsin, etmesin, Hz Ali ve ailesi etrafında bir gönül birliği ve taraflılığı oluştu. İşte, Hz. Ali sevgisi, Hz. Ali ile olan gönül bağı, böyle bir zeminde hayat buldu Anadolu'nun Kürt Aleviliği bu zeminin ürünüdür.

Aleviliği, Şiiliğin bir kolu gibi bilenler var. Lakin Alevilik ile Şii mezhebi farklı inançlardır. Çünkü alevi inanç ve ibadet usulleri ile Şia inanç ve ibadet usulleri çok farklı. Şiiler İslam'ın bilinen beş şartını esas alırlar. Aleviler bu şartları başka usul ve tarzlarda yerine getirirler. Alevilerin, inanca ve ibadetlerine ilişkin usul ve erkânı bu yazımızın içinde ele alacağız.

Anadolu ve Kürt Aleviliği arasında, inanç, ibadet usul ve tarzları bakımından farklılık var. Ancak; Kürt Alevileri arasında bariz farklar yok. Adıyaman, Malatya, Elazığ, Dersim, Bingöl, Erzincan, Sivas, Maraş, Antep, Muş, vb. yerlerin Kürt Alevileri, inanç ve ibadet usullerinde bir beraberlik vardır. Bu illerin içinde Aleviliği en sade ve saf olarak yaşayan il'in Dersim Alevileri ile civarındaki Aleviler olduğu görülmekte.

Aleviler, Müslümanlığa yaklaşımda farklılık gösterirler. Bir kesim alevi, Kur'an ve peygamberi kendilerine yakın ve esas alırlar. İnanç ve ibadetlerinin kur'an esaslarına göre olduğunu, esas İslam'ın takipçilerinin kendileri olduğunu savunurlar. Bir diğer kesim ise, Aleviliğin kendi başına bir inanç ve kültür olduğunu ifade ederler. Ve bu inanç ve kültürün İslam'dan bağımsız bir yapı olduğunu savunurlar.

Bu inanç ve kültürün, Ortadoğu halklarının en eski Zerdüşt inancından gelen, zaman içinde diğer inançlarla harmanlanarak, günümüze kadar yansıyan kültür ve inanç yapısı olduğunu savunurlar.

Bu ikinci tespitte yer alanlar; Aleviliğin bu gün yaşadıkları biçimi ile gerçek alevi inanç ve kültür felsefesinden uzaklaştığını, diğer inanç grupları ile bir ritüel benzerliği varsa bununda aynı coğrafyayı diğer halklarla beraber yaşamalarından ileri gelen benzerlikler olduğunu iddia ederler. Nitekim Zerdüştlükte,Eezidilik'te var olan bir çok inanç ve kültür ritüelleri ile dini otoritelerin işleyiş biçiminde yakın benzerlikler olduğu söylenebilinir. Örneğin Zerdüşt inancında pir, şêx, fakir, qewal gibi dini otoriteler varken,

Alevilikte, mürşit, pir, rayber(rehber), talip gibi dini otoriteler var. Bu kişiler kutsal ve emin insanlardır. Bu kişiler insanlara yardım ederler. İnsanları kötülüklerden korurlar. Zorluluklardan kurtarırlar. Bu zatlara saygı inanca saygıdır. Mürşitlik makamı peygamber makamıdır. Dört babadan kalan mürşitlik makamı var. a-Baba Mansur, b-Hacı bektaş veli, c-Axuçan makamı,d-Dede garkır makamıdır. Pir makamı Hz.Ali makamıdır. Rehber makamı, melek Cebrail makamı kabul edilir. Talip bu yola bağlı olan kişidir. Pirlik makamı [illegible] babadan oğla geçer. Pir olmayan biri sonradan pir olamaz.Rayber (rehber) pire çalışmalarında yardımcı olan kişidir. Pir kimin kendisine rayber (rehber) olacağına karar etme yetkisi var. Mürşit,Alevilikte bilgi ve marifetleri ile Alevilere yol, yöntem ve feyiz verme gücünde olan kişidir. Mürşit pirlerin piridir. Pirler taliplerinin sorunlarını çözmek ve onlara yardım etmek maksadı ile en az yılda bir kere taliplerini ziyaret eder. Ekonomik olarak durumu iyi olan taliplerinden aldığı yardımları durumu iyi olmayan taliplerine dağıtır. Pir bu çalışmayı yaparken rayber(rehber) kendisine yardımcı olur.

Kürt Alevileri, pirlerinden farklı olarak dualarını Kürtçe yaparlar. Açıklanma ihtiyacında olduğumuz bir husus "pirler neden dualarını Türkçe yapma ihtiyacındadırlar." Resmi otoriteye bağlılık bir neden olabilir mi?

Alevilerde sünnet İslam öncesi bir adettir. Sünnet adetine bağlı olarak kirvelik önemli bir kurumdur. Kivre, ailenin birinci derece akrabası kabul edilir. Kirvelikte alevi olsun, olmasın bütün Kürtlerde aynı derecede önemlidir. Alevlikte birde musaiplik kurumu var. Bu kurumda kivrelik kadar önem taşır. Bu iki kurum, aileler ve kişiler arasında kardeşliği, dostluğu ve birinci derece akrabalığı ifade eder. Kivrelikte evlilikler dokuz babaya kadar haramdır. Musaiplikte evlilikler yedi babaya kadar haram kabul edilir

Alevilerde ibadet şekilleri çeşitlidir. Cem; Alevilerde en önemli ibadet şeklidir. Cem için belirli bir zaman yok. Her alevinin yada pir'in tayın ettiği ev cem evi olabilir. Cem ibadetinde erkek kadın ve çocuklar beraber ibadet ederler. Cem ibadetini sadece pirler yönetir. Cem ibadetini yöneten pir'in yetkin olması arzu edilir. Cemi yapanlara dewrêş denir. Kürt Alevilerinde cem ritüelleri aynıdır. Cem ibadetini yönetmek bazı kabiliyet ve özelliklere sahip olmayı gerektirir. Aleviler oruçlarını farklı zaman ve sürelerde tutarlar. Gaxan orucu 12.ayda 3 gün oruç tutulur. Oruçtan sonra niyaz edilir, kutsal ekmek dağıtılır. Daha sonra şenlik yapılır.Rojiya Xızır. Bu oruç da üç gündür. Bazı yerlerde beş gün de tutarlar. Bu oruç birinci ayın 10.günü ile 2.ayın 20. günleri arasında tutulur. Xızır, Alevilik inancında önemli bir fenomendir. Her an her yerde insanların yardımına yetişeceğine inanılan ilahi bir zattır. Xızır inancı alevi olmayan Kürtlerde de aynı yücelikte kabul görür. Hiristiyanlıkta noel babanın senede bir gün çocukları sevindiren o gayretini, Xızır nebi her an bu kutsal gayretın içindedir. Rojiya muharremê; Bu oruç 12 gündür ve 12 imam için tutulur. Bu oruç muharrem ayında tutulur.muharrem orucu bitiminde aşure ve lokma ziyafeti ile ibadet son bulur. Bingöl, Karakoçan ve bazı çevre illerde vartivar adı ile başka bir bayram yapılmaktadır. Muhtemelen bu bayramın Ermenilerden, bölgedeki kürt halkının da kültürleri arasında yer aldığı düşünülebilinir. Aynı coğrafyayı paylaşan halkların zaman içinde birbirilerinin kültürlerini dillerini, kültürlerini etkilediği bir çok değerin cömertçe paylaşılması doğaldır.

Alevilerde ve tüm Kürtlerin kültüründe güneş, ay ve ateş önemli simgelerdir. Güneşin doğuşu ile dua etmek, güneşe karşı abdest yapmak, günah ve saygısızlık kabul edilir .hilal halindeki ay'ın görünmesi ile dua etmek, ateşe su dökmek, tükürmek günah kabul edilir. Ateş kendi külleri ile kapatılmalı. Alevi ve tüm Kürtlerde ermişlerin türbelerini ziyaret etmek, adak ve kurbanlar kesmek köklü bir gelenektir. Alevilikte dağ, göl,çem ve ulu ağaçlar önemli simgelerdir. Düzgün Baba, Kırklar dağı, Jele dağı, Koyê Bugene, Kox, Sümbül dağı, Soro Baba, Çemê Munzur çiyayê sipî v.b. daha bir çok mekan ziyaretgah ve kutsal kabul edilir. Bu mekanlara yönelik çeşitli destanlar, rivayetle. hikayeler anlatılır, şiirler okunur.

Alevilik esas olarak insanı , insanın yücelmesini, doğa ile beraber özgürleşmesini ve bu şekilde mükemmeliyete erişileceği savunulur. Yaşamda iyilik ve kötülük yan yana yürür. İyilikten mi? kötülükten mi? Yana olacağına insanın kendisi karar verecektir. İnsanın yapacakları onu cennete veya cehenneme götürür. Cennet ve cehennem yaşanan mekandır. İnsanın eline, beline, diline sahip olması şarttır. Temelinde insan sevgisi bulunan, her dine, inanca , mezhebe saygı duyan ve hoş görü ile bakan, dil, din, ırk, renk farkı gözetmeyen, insanların yaşadıkları toplumda kendilerini yargılayabilen, laik olabilen, eşitlikçi, paylaşmacı düşünceyi savunmak, Zalime ve zulme karşı olmak, Mazlumun ve mağdurun yanında durmak, aslı doğruluk, faziletli insan yaratmayı, korkulardan uzak bir yaşamı esas alan felsefik ve kültürel birikim ve yaşam tarzı.Bu düstur Zerdüşt inancında da iyi düşün, iyi konuş, iyi yap şeklinde ifade edilmektedir.

Alevilikte nikah merasimi önemlidir. Nikahı kıyılacak gençlerin pirleri iki genci karşılarına alarak, iki şahidin huzurunda, birbiri ile evlenmek istediklerini duyduktan sonra, ortaya konulan bir tas su, bir bıçak, bir kalıp sabun ve bir havlu nikahlarının kıyılma merasiminde olması gerekli olan eşyalardır. Su ve sabun temizliği, bıçak, Allah, Muhammed, Ali adına, tastaki suyu üç defa kesme ritüelini yerine getirmede kullanılır. Merasim bitiminde Pir iki gencin evliliğini şahitler huzurunda ilan etmeden, gelinin damattan ne kadar mal,para v.s alacaklı olduğunu sorup cevabını aldıktan sonra nikahı ilan eder.

Alevilikte düşkünlük denilen bir cezalandırma geleneği var. Bir insanın topluma yönelik söz ve davranışları ile hata işlemesi, yüz kızartıcı bir fiilde bulunması, toplumun örf ve adetlerine ters düşmesi halinde, toplum içinde dışlanmasına, tecrit edilmesine, yanı onunla ticaret edilmemesi, topluma kabul edilmemesi, kısaca yalnızlaştırılması ile cezalandırılmasıdır.

Mehmet AKAR

Changed with the DEMO VERSION of CAD-KAS PDF-Editor (http://www.cadkas.com).
Changed with the DEMO VERSION of CAD-KAS PDF-Editor (http://www.cadkas.com).
Changed with the DEMO VERSION of CAD-KAS PDF-Editor (http://www.cadkas.com).



DI WÊJEYA DEVKÎ YA ZAROKAN DE MAMIK Û TIŞTENOK

Tiştenok û Mamik Çi ne?
Mamik an jî tiştenok, ji wêjeya devkî ya gel beşeke bi taybetin. Weke ku ji navê wan jî tê fehm kirin bêtirîn ji bo perwerdeya zarokan hatine pêk anîn.

Mamik û tiştenok, çûriskên hêmaya fehma gel yên jiyanî ne. Kes nizane ku ew berhemên hêja di aliyê kî kesî ve û di çi demê de hatine afirandin, loma ewan ber û berhemên hizra gel in û divê mirov weke mal û mêrateya gel li wan binêrî.

Ew berhem, pirs û hevokên qalib û kilîşe kirî ne. Di mamik û tiştenokan de, pêş de navê bûyerê, tişt û têgîhê nayê dayin. Bi teşeyekê sergirtî tê xwestin ku bi remz û nîşanan ew tişt an bûyerên hatî pirsîn bêtin dîtin û zanîn.

Changed with the DEMO VERSION of CAD-KAS PDF-Editor (http://www.cadkas.com)

Gel bi gelemperî bi vegotineka helbestî mamik û tiştonekên xwe pêkanîne, bona wê ew berhemên ku li wêjeya zarokan re bûne hîm û bingeh heta roja me hatine.

Mamik û tiştenok bi gelenperî di forma pirs û vepirsînê de hatine holê û ew pirs, bûyerên xwazeyî, mirovan, giyanwerên wek heywan û nebatan, tiştan, motîfên olî û çandî bi teşeyekê ser girtî, diwesifîne û bi remz û sembolan dide pirsiyar kirin.

Hêmayên ku dibin wateya mamik û tiştenokan, pêwîste bi remz û sembolan bêtin nasandin û yên li hember jî bi şopandina wan remz û sembolan bersîwa wê bişopîn in.

Di mamik û tiştenokan de zimanekî bi taybet ku gora xwezaya wan in tê bi kar anîn, ji ber ku mamik û tiştenok ji bo zarokan in û zarok jî di asta hînbûn û karanîna zimanê zikmakî yê yekemîn de ne.

Mamik û tiştonek ji du beşan pêktên. ji van beşan beşa yekemîn pirs e, ya duyemîn bersiv e. Beşa pirsê, yan bi forma "Tiştikekî min heye?" dest pê dike û pirsa sereke dawiyê re tê, yan jî raste rast bi pirsa sereke dest pê dike. Beşa duyemîn, bersîv e, bersîv carinan ji pêyvekê carînan jî ji hevokek e pêk tê.

1. Axurekî mala bavê min heye; tê de têjî gayên beş in?
2. Agirekî min heye; dikeve avê natemire?
3. Apkê min î rû kur kirî, bi şev û roj dar ve kirî?
4. Apikê sincik, bezî quncik?
5. Apkê minî'b çavekî, min da teresbavekî, wî da bin kulavekî?
6. Apkê minî'b lingekî, ber naxira gundek î?
7. Apkê minî'd deştê de, barek dirî piştê de?
8. Apkê minî'd tirbê de, çovî repî'd mistê de?
9. [illegible]
10. Barkêş ê bar giran e, li mêrgê wek began e?
11. Ew bê can û bê rih e, diaxîv wek meriv e?
12. Bê dest û pê hat ji çê, Da ber xwe bire deştê?
13. Ew bê dest û bê pêye, digere'l dîwara ye?
14. Bê dest û pê gerok e, bê pere tebat nake, tiştek jê xuya nake, ew xwe re nankorek e?
15. Bê reng e lê bi deng e, ew ji bo erdê şeng e, ji pê hev tê diçilk e, erd û asman şil dike?
16. Bê serî û bê ling e, diçe bajar û gund e?
17. Hespa mina çindirkî, tîza dave bi tirkî?
18. Erewekî reşî simbêl badayî, diya te, tê ve radayî?
19. Sorî qusandî, bin we re kişandî?

Mehmet Oncû
Lekolîner-Nivîskar
ademan@gmaîl.com

BERSIV

1	DIRAN	11	YELEWÎZON
2	TÎROJÊN ROJÊ	12	ÇEM/RO
3	DERÎ	13	DARA LI DÎWÊR RAPÊÇÎ
4	MIŞK	14	BERÎK
5	ŞIJÛN	15	BARAN
6	MÎRKUT (DARSOQÎ)	16	ÇEM/RO
7	JIJO	17	KÊÇ
8	GIZÊR	18	KUZ/DEN
9	SÎXUR	19	MEXFÛR/XALI
10	KER		

FERHENGOKA LÊKERAN

Hatin—Gelmek
Xistin—Düşürmek
Xwarin—Yemek
Kirin—Yapmak
Anin—Getirmek
Dan—Vermek
Gotin—Demek
Girtin—Yakalamak
Kuştin—Öldürmek
Çûn—Gitme
Mirin—Ölmek
Ketin—Düşmek
Gihaştin—Varmak
Revîn—Kaçmak
Man—Kalmak
Girîn—Ağlamak
Peyivîn—Konuşmak
Şandin—Göndermek
Şkênandin—kırmak
Rijandin—Dökmek
Xwandin—Okumak
Alastin—Yalamak
Vexwarin—İçmek
Birin---Taşımak
Bezîn—Koşmak
Barîn—Yağmak
Borîn—Geçmek
Şewitîn—Yanmak
Tırsîn—Korkmak
Pirsîn—Sormak
Dizîn—Çalmak
Rîn—Siçmak
Pan—Gözetmek
Zan—Doğmak
Pêçan—Sarmak
Kelan—Kaynamak
Çêran—Otlamak
Geran—Dolaşmak
Bezan—Koşmak
Bûn—Olmak
Çûn—Gitmek
Sûn—Bilemek
Cûn—Çiğnemek
Dirûn—Dikmek
Pûn—Serpilemek
Birîn—Kesmek
Çêrandin—Otlatmak
Hejmartin—Saymak
Şandin—Göndermek
Weşandin—Silkmek
Revandin—Kaçırmak





DI NAV KURDAN DE ÇEND GOTINÊN SERSALÊ

Berê din av kurdan jî kevneşopiyeke pîrozkirina sersalê ya wekî têatreal hebû. Xortên û zarokên gund li mal û taxan digeriyan hem sersala maliyan pîroz dikirin hem jî ji bo pîrozkirina sersalê tiştên xwarinê berhev dikirin û ew gotinên li jêr di wê demê de li ber deriyê malê bi hev re bi yek dengî digotin:

* Serê salê binê salê li nava malê xwedê kurekî bide bûka malê
* Serê binê salê yê ku bide bereket bikeve malê yê ku nede gûyê nahlê
* Serê salê binê salê xwedê evînekê bide xortê malê
* Serê salê li hinda malê xwedê kalekî bide pîra malê
* Serê salê binê salê xwedê bereketê bixe ardê malê

Piştî ku zarok û xortan tiştên xwe berhev dikirin diçûn maleke mêvanperwer û heya nîvê şevê lîstik dilîstin, çîrok û stran digotin û tiştên ku berhev kirî bi hev re dixwarin.

Bi hêviya ku sersalên bi wî rengî zarokên me jî pîroz bikin

Di Zargotina Kurdan a Zarokan de Çend Nimûne ji Hêjmarok, Lezbare û Zûgotinokan

1.
Hêkê Hêkê
Hêkê hêkê,
du nazikê,
çepê repê,
aravingê,
hestiyê kewê,
da bin kewê,
çêle-dîk,
çav-sipîk...

2.
Kurê Mencê
Kurê Mencê,
Çû qezencê,
Gurek dît,
Xwe ve rît...

3
Hêkê Hêkê
Hêkê, hêkê,
hêlinekê,
gula çepkê,
çepil mijkê,
te por gijkê,
xizonejkê,
Guhpejînkê...(1)

4
Yeklo Duklo Me Da Ger
Yeklo duklo me da ger,
çar çembîlê gulower,
şemqor(2) dada li hember,
qulinga me hate ber,
me pa li me bû êvar,
êvara me tarî,
qulinga me firî,
zîpik li me barî...

5
Metê Metê
Metê metê metan ê,
li xwe kirî fîstan ê,(3)

(1)Ew hêjmarokek e, dema ku zarok dilêhîzin, bona ku li ber liskê kom gurupan pêk bînin hevdu dejmêrin.

(2)Şem qor; Li herema Semsûrê navê dafika civikan e.

(3)Lixwe kirin; wegirtin.

met çûye ber bîstan ê,
bîstanê me zeweş e,
zeweşê dendik reş e,
apê minî nexweş e,
kanê parçek zeweş e,
zeweşê metê xweş e,
navê metê Ewêş e,
ewêşa mange doş e...

6
Meta Zînê
metê, meta Zinê,
kerê hildikşîne,
kera bi zengil e,
xwînê vile-vile,
gêştî nav mosil e,
mosil bavê gişta,
yekê kurek anî,
yekê kecek anî,
li ser estêr danî.

7
Tîto, Tîto
Tîto, tîto,
berxa vîto,
navî dila,
kete cila,
acîrê fiş,
veqeleş,
yek êmiş,
yek gamêş,
du zobe di desta da,
bire mala Fatê da.
Fata kinik,
bezî darik,
Fatê rabû derket,
meşya, teşî jê de ket.

8
Yeklo Duklo
Yeklo duklo bi Tirkî,
hew henarka bizirkî,
mar û mişko li palê,
rovî berdan xezalê,
qumqumoka ser darê,
pîrewoka ber malê.

9
Hêkê Hêkê
Hêkê hêkê,
du nazikê,
çepê repê,
aravingê,
hestiyê kewê,
da bin kewê,
çêle-dîk,
çav-sipîk...

10
Rovî
Rovî rovî rindik e,
boç û dêlê kindik e,
çûye mala xalik e,
aniye piştiyek darik e,
bêjmêre ku pêyvê rovî
ne bîst û çar e,
qetlê rovî li te helal e.

11
Çîrok
Çîrok çîrok,
mamkê kîrok,
Bekrê yarê,
ket kewarê,
şûjin tê re,
di boçê re,
Xec xatûnê
Boç kemînê
bavî axa, dê xatûnê...(4)

(4)Muhtemele ku ew hêjmarok hêjmaraka li ber çîrokan e. hêjmarokên bi vî rengî di destpêka çîrokê de ji bona ku bala guhdarvanên wê çîrokê bikêşe ser çîrokê di aliyê çîrokbêj de tên gotin.

Hêjmarok û Lezbareyên di Zimanê Kurdî de- Mehmet Oncû

HÊJMARÊN KURDÎ

1 YEK,	8 HEŞT	15 PAZDEH	40 ÇEL(Çıl)
2 DU (didu, dido, do)	9 NEH	16 ŞAZDEH	50 PÊNCÎ (Pênce)
3 SÊ (sisê)	10 DEH	17 HEFDEH	60 ŞÊSTÎ
4 ÇAR	11 YAZDEH	18 HEJDEH	70 HEFTÊ
5 PÊNC	12 DOZDEH	19 NOZDEH	80 HEŞTÊ
6 ŞEŞ	13 SÊZDEH	20 BÎST	90 NOD
7 HEFT	14 ÇARDEH	30 SÎ (sîh)	100 SED

Changed with the DEMO VERSION of CAD-KAS PDF-Editor (http://www.cadkas.com).



Belkî
Welat DILKEN

Kurdiya Semsûrê û Daqurtandina Tîpan

Wekî ku min di nivîsa beriya vê de jî gotibû; zimanê axavtinê yê gel serbest û ne standart e. Di nav wê serbestiya axavtina gel de min mînak dabû, ku di hin peyvan de tîp cih bi hev diguherînin. Ew yek belkî wekî pirsgirekekê bê dîtin, lê di hemû zimanên ku ne zimanê perwerdehiyê ne de ew pirsgirek heye, heta di pir zimanên ku sedan salin bûne zimanê perwerdehiyê de jî heman pirsgirek rû didin. Belkî perwerde nikaribe bi temamî wê pirsgireka axavtina gel a rojane biguherînê, lê belê dikare pirsgirekên ne standart ên axavtina gel a rojane kêmtir bike û hinekî din nêzî santartîze bike.

Di vê nivîsê de ez dixwazim li ser pirsgirekeke ku di axavtina Semsûriyan de rû dide bisekinim. Ji ber nebûna pergala zimanê kurdî ya perwerdehiyê. Ji ber nebûna têkîliyên Semsûriyan ên bi bajarên Kurdan ên din re, dibe sedem ku carina di axavtina kurdî ya Semsûriyan de tiştên ecêb derkevn holê. Ew pirsgirek heya cihekî normal e, lê dema ku li Semsûrê li ser kurdî xebateke berhevkirinê, lêkolînê, yan jî xebateke hînkirinê dixwazî bikî, ew pirsgirek derdikeve pêşberî te û ji xebata te re dibe kelemek.

Ez di nivîsa beriya vê de li ser cih bi hev guhertina tîpan rawestîbûm. Di vê nivîsê de jî ez dixwazim ku li ser daqurtandina tîpan bisekinim.

Ew daqurtandina tîpan min di axavtina kurdî ya li Sermsûrê de bihîstine. Bi çend mînakan ez ê hewl bidm ku bi xwendevanan re van tîpên ku tên daquertandin bi mînakan parve bikim.

1-cînavka "**Hûn**" ê ye. Bilêvkirina vê cînavkê ya rastî wiha ye, "**Hûn hatin mal, hûn diçin mal** û hwd. Lê li Semsûrê ne bi rastiya wê, ew bi awayên cûda tê bilêvkirin. Çend mînak wiha ne; "**on tên mal, on terin(diçin) mal**. Mînakeke din, **"ûn tên vir, ûn herin wir"** û hwd. Heta hevalekî me yê bi navê Şerîf heye, ew vê tîpdaqurtandinê gavek din bi pêşve dixe û dibêje, "**Hün"** çi dikin. Yanê "**ü**" ya ku di alfabeya kurdî de tunê tîne dixe alfabeya zimanê kurdî.

2-cînavka "**Ez**" ê ye. Bilêvkirina vê cînavka kesê yekem wiha ye, "**Ez nanî dixwazim, ez têm mal, ez terim(diçim) mal, ez avê vedixwim, ez şora li te nakim, ez ji wê hez dikim û hwd…**

Lê di axavtina Semsûriyan de mînak bi vî rengî ye; "**e zî nên dixwim, e zî têm ba te, e zî terim bajêr û** hwd. Yanê ji dewsa ku bêjin; **Ez î nên dixwim, ez î çayê vedixwim, ez î nexweşim, ez î evîndar im,** dibêjin **"e zî û nizanim çi"**… Pir caran jî tîpa "**z**" jî tê daqurtandin û "**e**" bi tena serê xwe dimîne. Mînak bi vî rengî ye; **(e)** çûm ba wî/wê, (**e**) çayê venaxwim, (**e**) neçûm bajêr û hwd. Divê em bibîr bixin ku, mînaka "**e zî**" di Dimilî de ketiye axavtina Semsûrê. "**zî**" di zaravayê Dimilî de daçek (edat) e û di kurmancî de jî hemberê wê daçekê (edatê) "**jî**" ye. Bêguman ew **zî** ji dewsa **jî** naye bi lêv kirin lê, bilêvkirina (**zî**) ji hebûna daçeka **zî** ya di Dimilî de sûdê werdigre.

3-cînavka "**xwe**" ya vegerok(dönüşümlü zamir) e. Bilêvkirina vê cînavkê ya rastî wiha ye; "wî ji (**xwe**) re çayek anî, wê halê (**xwe**) ji min re negot, wê nehişt ku ez halê (**xwe**) li ber wê kim û hwd. Lê li Semsûrê tîpa "**w"** ya di (**xwe**) yê de tê daqurtandin û bilêvkirinên wiha derdikevin holê; **e** bi **xe** neçûm wir, min di ber **xe** de got û got, û hwd.

Mînaka rastî **xwenga** min, **xweşika** min çû mala xwe. Lê li Semsûrê dibe **xa** min çû mala **xe**.

Wekî encam, diyarkirina van tespîtan ne ku axavtina Semsûriyan ya kurdî kêm û têrê nake ye. Lê divê em bi van tespîtan hewlkeke bidin ku, hêdî hêdî em zimanê xwe bibervî standartîzebûnê ve def bidin û karibin ji her kurdî re bi zimanekî kurdî yê hevfamkirinê bidin û bistînin.

Bi hêviya ku sala nû, aştî û serbestiyê bi qolincên zayînê bixe, sersala we pîroz be.

Changed with the DEMO VERSION of CAD-KAS PDF-Editor (http://www.cadkas.com).

ÇÎROK

KER KÛÇIK Û GUR

Dibêjin rojeke ji rojan kerek, li ber zordarî û bê wîjdaniya xwediyê xwe revî, ewil li malê paşê li gund bi dûrket ji xwe re ser hev ve çû û çû…

Ewqas bê hemd û bi hêz diçû ku kesî nezanî ji ku ve û çiqas çû, ker hat ser hişên xwe ku li çolêye, di nav tereşekî de du çav dibiriqine, xwe lê girt û çû. Dema nêzîkê bu bala xwe dayê ku kuçikek xwe li xeteriyeke veşartî wîsa li wire, got; "Tu ji vê derê çidikî bi tenê? "Kûçikê got;"Bawer bike ez li zordariya xwediyê xwe revîm!" Kerê got; "Ez ji dest zordariya xwediyê xwe revîm." Kerê û bi kûçikê ve fehm kirin ku derd û xemên herduyan jî wekî hev in, kerê dest bi gilî û gazindên xwediyê xwe kir û got; "Xwediyê min gelek bê wîjdan û berjewendperezbû, têr nedida min, barên gelek giran li min bardikir û di ser de jî gelek li min dida, rênc bi min dikir!"

[illegible] xwediyên wî li wî kirî kir, got; "De ka bide pêyî min em biçin, heta ku me ji xwe re dereka sitare û ku em xwe bikarin bispêrin dîtîye." Kerê got; "Malava, ma em ê bi kû ve biçin? "Kûçikê got; "Dinê firehe, îleh dereka ku em lê bihebin dê hebe." Kerê got; "Hekê em xwe li maleke bigrin, her çi mal be jî divê em ji bo danek xwerin ji wê malê re bibin dest û pê, ne wîsa be me nahebînin û xwedî nakin."

Kûçik got; "Hey mal ava, çira em biçin mala, me bext li destê xwe ye, hemî der mêrg û çîmenin, em ê biçin ser wa mêrgan, tê li ser ew avên sar û gîhayên hêşîn biçêrî, têre têr vegevizî , ez jî dê ji xwe re nêçîrê bikim." Li ser vê biryarê, herdu bi hev re ketin ber tenişta hev û çûn. Ji piştê demeke hatin li quntara çiyayekî li deriyê şikeftekê rawestiyan, kûçikê got; "Ewder xweş bingehe ji me re, av nêzike û çêre pire. Tu ji xwe re ji vê derê biçêre, ez ji dê biçim vî çiyayî neçîrê, carna jî ezê biçim perê gundekî, divê xort û zarok qetek nan bidin min, belê agahdar û hişarbe, heta me ew der baş naskiriye tu nezirî û tu kesî li me [illegible]

Kuçik û ker çend deman man li wê derê, ker li ser wê mexela xweş û avsar qelewbû, kêfa wan her li şûnêbû, bilî tiştekî. Ew tişt jî nîşana kesetiya wî bû, divêt ji piştê xwerinê têr vegeviziya û biziriya, lê kûçikê ji wî re gotîbû, heke gur li te bihesin yê bên kovala te berdin erdê û te bixwin, lewra kerê nediwêrîbû ku mercên kesetiya xwe bîne cih…

Rojeke biharê yê xweş, têrtav û bi rengîniya tîrojê xemilî kûçik çû neçîra xwe, ker derkete mêrgê, zikê xwe li ew gîhayê hêşin û taze têkrir pêy ve têre têr vegevizî û bê hemdê xwe got; "Zir!" û zirî. Ji dengê zira wî re gur pê hesa, hat li dora wî zivirî. Dema kerê hatina gurî sehkir, revî çû paşiya şikeftê, gurî got; "Kuro, çima bê

pirsiyar tu hatî ser koz û pawanê min? Ma tu nizanî kozên holî bê xwedî nabin?"

Kerê got; Ma kêngê ew koza bu ya te?" Gurî got; "Ew koza mine û min qoqaniyên reş pê hene û xelkê vî warî tev dizanin va koza di bav û kalan de ya meye." Kerê got; "Ez qoqaniya qebul nakim, te qoqanî bi fên û fîtan li vir daye, esîl govane, hekê tu ji min re govanekî bînî min qebule." Gurî got;" Li ser serê min, xelkê vî helatî hemû dizane ku ew kozî ya me ye."Piştê gotinê gurî çû…

Dema gur çû ker wîsa ma li jor, êdî newêrî derkeve, guhgêj û sor ma li benda kûçikî… Ji piştê bêhnkê kerê dîyarkir ku kûçik derket û hat. Dema çavê wî li hevalê wî dikeve, dibêje; "Te çiye, vê roja xweş wîsa tu ji mal de mayî? Kerê got; "Ma çi ji te vesêrin bi xwedê zira vî mêrî hat û zirî!" Kûçikê got; "Yanê gur li te pêyda bû!?." Kerê çîroka xwe û gurî gotarî wî kir pêy ve, kuçikê got; "De rabe ku em çalekê bikolin da ku ez xwe tê de veşêrim, dema gurî hat, bêje; ez govanê te qebul nakim, ji ber ku dinê gelek bêbext bûye, te çû ew bertîl kir ku govaniya te bike." Kûçikê bi pêyê xwe cîhê çalê bi kerê şanî da û got; "Ji gurî re bibêje, heta tu bixwe bi serê vê xiyaretê sond nexwî ez qebûl nakim, dema hat, ez xwe bavêm ser wî bi gepira wî re bigrim, tu jî bi pêhnan lê bide heta me ew vêk re kujtiye."

Li ser wê biryarê, ker û kûçikê bi hev re çaleka xwe vedan, kûçikê xwe tê de veşart, kerê bi pel û çilayan serê wî niximand, wîsa li benda gurî man…

Di wê nêvberê de gur, ji bo xwe li gurekî alîkar gerî nedît, roviyek bi berçavên wî ket, rast çû pêşa wî, piştê ku çaxêr li hev kirin, gurî got; "Xwerzêyê jîrek, xenîmetek qelew ji me re daketiye, bêyî rex min, ji min re govaniyê bike ku; ew kozik ya xalê min gure, da ku em bixwin goştê narîn û taze." Ew pêşniyarê kêfa rovî anî, rovî da duv gurî, bi hev re hatin şîkeftê…

Dema ji deriyê şikeftê re dikevine hindir, rovî bêhna kûçikê seh dike, berê xwe didê lê tiştekî nabîne, gurî dibêje; "Aha govanê min ew e." Kerê got; "Mam rovî, hele bêyî ka tu govanê kî demêyî?" Ji ber ku rovî bêhna kûçikê pitir sehkir, paşepêkî çû, got; "Baweke ez pîr bûme, çavên min tarî bûne, ez baş nizanim tîxûba gurî ew dere an dereka dine. Ez nikarim xwe ji xwedê bikim, îro ronahiye sibe tariye, zarokên min hûrin ez nikarim govaniyê bikim…"

Li ser lêborîna rovî ker zivirî gurî, got; "Dinya sonde an govane, te govan nîne, ka bêyî ji min re sond bixwe ku ew koza teye." Gurî got; "Ezê ji te re bi çi sond bixwim? "Kerê got; "Bêyî bi vê ziyareta ji bin gelgelê sond bixwe." Li ser şertê kerê, gur bezî çû ser çalê û got; "Bi vê ziyareta bin gelgelê be…" Gurî hê sonda xwe temam nekirîbu kûçikê jer de xwe li nîgira wî da û kerî ew da ber pehînan, gurî kujtin û xwe jê tena kirin…

Changed with the DEMO VERSION of CAD-KAS PDF-Editor (http://www.cadkas.com).

ŞORBE

Diyako
Wergervan-Nivîskar
knowtake02@hotmail.com

Kesekî Beynelmîlel

Belê piştî demekê em dîsa gîhîştin hev. Min navê quncikê xwe jî kir "şor-be". Hêvî dikim ev şor-be tim û tim bikele, bi tama xwe devê we bitamijîne û hundira we germ bike. Belê çima şorbe? Peyveke semsurî ku li ber kurmanciya me pir delal e heye. Ew jî "şor" e. Yanê gotin an jî peyv. Quncikê min jî an jî ez bêjim şorbeya min jî dê ji şoran pêkwere. Hêvî dikim pir şor jî nebe!

Baş e, min di hejmara din de qala Osman Sebriyê nemir kir îcar jî ez dixwazim hinekî ji were qala şexsekî din ê hêja û qedirbilind bikim. Belê vê carê jî ji ser şorbeye min dê bêhn û kela sînemayê rabe. Ez bawer dikim hûn texmîn dikin ez ê behsa kê bikim. Jixwe sînema û Semsûr kê tîne bîra we? Belê we rast got. Ew kesê rûken ê xwîngerm; ew kesê zana û berxwedêr, kekê Sirri an jî Sirri Sureyya Onder e.

Sirri Sureyya Onder di 7'ê Tîrmehê sala 1962'yan de li Semsûrê di malbateke berxwedêr de hat dinê. Herwekî tê zanîn, bavê wî ne bi tenê berber bû herwiha li Semsûrê serokê TİPê(Partiya Karkerên Tirkiye) bû û kesên mîna Behice Boran, Nihat Sargin, Deniz Gezmiş ji mala wan kêm nedibûn. Sirri Surreya Onder di malbateke wiha berxwedêr û kedkar de gihaye û hîn di ciwaniya xwe de heps nas kiriye. Di sala 1978'an de dema ku wî li Lîseya Semsûrê(Adiyaman Lisesi) dixwend, ji ber ku Komkujiya Meraşê şermezar kiribû ket hepsê. Piştî ku ji hepsê derket, ji ber ku li Zanîngeha Enqere, Fakulteya Zanyariyên Sîyasî qezenc kiribû, çû Enqereyê. Lê li wir jî zext û zordariyan ew tenê bernada. Di derbeya 12'ê Îlonê de ew dîsa hat girtin û heft salên xwe di hepsê de derbas kirin.

Sirri Sureyya hîn di zaroktiya xwe de sêwî dimîne.Dema bavê wî dimire ew hîn 8 salî ye û di nava 4 zarokan de yê tewrî mezin ew e. Piştî mirina bavê, malbatê gelek tund û tûjahî dîtine. Ji bavê wî jî 35 hezar lîra dehn û gelek pirtûk dimînin. Dost û merivên wan dehnê wan didin û malbata Onder jî diçe li cem kalikê wî dimîne.

Ew di 8 saliya xwe de li cem tekane wênekeşî li Semsûrê wek şagirtekî dest bi kar dike û di ber re perwerdeya xwe jî didomîne. Sirri Sureyya li dibistanê xwendekarekî serkeftî ye; di pêşbirkên zanyariyê û munezereyên Milliyetê de dereceyên yekemîniyê digire. Yekemîn pirtûka ku wî xwendî pirtûka Orhan Kemal a bi navê Bereketli Topraklar(Axên Bibereket) e. Dema ku li Lîseya Semsûrê dixwîne mamosteyê wî yê edebîyatê wî bi Dostoyeskî re dide nasîn û ew êdî qet "Birayên Karamazov" ji destê xwe danayne. Hîn dema ku li lîseyê di pola yekê de ye di şopa bavê xwe de dihere û di rexistinên sosyalîst de cihê xwe digire. Jixwe dema di pola duduyan de ye, herwekî li jor jî hat behskirin, ji ber şermezarkirina bûyerên Meraşê tê girtin lê ji ber ku temenê wî biçûk e zû tê berdan.

Ji ber ku debara malbatê li ser mila wî ye, ew ji lastîkvaniyê bigire heya tamîra erebeyan di gelek karan de dixebite. Ji ber heman sedemê ew li zanîngeheke ku pêwîstiya berdewamiyê tune, digere. Xwendekarekî Mulkiye ku li girtîgehê nas dike rê nîşanî wî dide. Ew jî weke kesê duyemîn dikeve Siyasala(Fakulteya Zanyariyên Sîyasî) ku tekane tercîha wî ye. Li zanîngehê jî tevî xwendîne mecbûr e ku bişixule. Di karên cur be cur de dixebite. Di nav re jî carinan şevê li pawyonê dişixule. Sirri Sureyya Onderê ku di çûkiya xwe de dest bi lêxistina sazê dike, li vê enstrûmanê cimbiş û ûdê jî zêde dike. Di 12'ê Îlonê de dîsa dikeve girtîgehê. 12 salan lê dibirin û ew bi grevên birçîbûnê û berxwedêriyê jiyana xwe ya hepsê berdewam dike. Sirri Sureyya 7 salan li girtîgehê dimîne lê dema dertê mafê wî yê xwendîne jî ji destê wî tê girtin.

Dema ku ji girtîgehê dertê û tê Semsûrê, êdî Semsûr ne Semsûra berê ye. Kardanê li wir berde kes silavê jî lê nake. Ew jî li ser vê yekê dihere Stenbolê û li şîrketeke Sîrkecîyê weke şoforê kamyonê dest bi kar dike. Bi rastî bajar bi bajar gerîn xweşiya wî jî dihere…

Belê rojekê bi dehn kamyonekê dikire û karê xwe bixwe dike û dûre dizewice lê belê piştî çar salan karê wî jî zewaca wî jî xera dibin. Ji wê zewacê keçeke wî ya bi navê Ceren ku niha 16 salî ye,tê dinê.

Barê wî yê giran qet sivik nabe. Ew li Rûsya, Ûkrayna û Bulgarîstanê di înşeatê de dişixule. Dema ku di înşeatê de dixebite jî di wextên xwe yên tal û vala de romana bi navê "O Tozlar Bu Çamurlari Getirdi"(Wê Xubarê Ev Herî Anîn) dinivîse. Ev roman derbarê 12'ê Îlonê de ye. (Bi qasî haya min jê heye, Sirri Sureyya Onder niha jî li ser vê romanê dixebite û tê payîn ku demeke nêz de were çapkirin.) Dema Senaryo Studyosu wî hildigire, ew li ser nîvîsandina senaryoyan xwe xurt dike û herwiha nivîsandina senaryoya vê pirtûkê jî di serê xwe de disêwirîne. Jixwe Beynelmîlê jî senaryoya xwe ji vê pirtûkê girtiye. Sirri Sureyya di wê wextê de li ser sînemayê gelek dixwîne û serwext dibe. Piştî demekê debara xwe jî bi nivîsînê dike. Senaryoyên rêzefîlmên mîna "Kızlar Yurdu"(Wargeha Keçikan), "Aşka Sürgün"(Mişextiya Evînê), "Emret Komutanım"(Ferman Ke Komandarê Min) jî wî nivîsîne.

Sirri Sureyya Onder bi fîlmê Beynelmîlelê ku di 2007'an de hat pêşandan gaveke qehîm davêje nava serpêhatiya xwe ya sînemayê. Fîlm ji festîvalên netewî û navnetewî gelek xelatan hildigire. Sirri Sureyya hem senaryoya vî fîlmî dinivîse û hem jî bi Muharrem Gülmez re tev derhêneriya vî fîlmî dike. Ew karê lîstikvanî û mûzîkçêkeriyê jî dike. Li gel Beynelmîlel, Sirri Sureyya derhêneriya kurtefîlmê bi navê Taş Yok mu Taş? (Ma Kevir Tune Kevir?) jî kiriye.Tevî senaryoya Beynelmîlel senaryoya fîlmê O… Çocuklari (Zarokên O…) jî nivîsiye. Mûzîka Beynelmîlelê jî bixwe çêkiriye. Ew tevî ku di fîlmê Beynelmîlel de jî dilîze di fîlmên Ada: Zombilerin Düğünü *"Girav: Daweta Zombiyan"*(2010), Ejder Kapanı *"Dafîka Ejdiya"* (2010), Sis ve Gece *"Mij û Şev"* (2007) de jî wek lîstikvan cih digire.

Belê, di van demên paşîn de em wî di rojnameya Radîkal'ê de wek qunciknivîs dibînin û di platformên cur be cur de jî ji fikrên wî yên zelal, eşkere, wêrek û dostanî sûdê werdigirin. Sirri Sureyya di van demên dawî de jî ji bo ku li ser bûyerên Meraşê fîlmekî bikişîne, xebatên xwe dimeşîne. Hêvî dikin fîlmekî payebilindtir derkeve holê.

Tiştên gotinê pir in lê ez yên mayî jî ji we re berdidim. Jiyana Sirri Sureyya Onder jiyaneke berxwedêrî, hêvîparêzî û serkeftinê ye. Hêvî dikim min karibû jiyana wî Sirriyane binivîsim û bi şorbeya xwe "zik"ê we têr bikim. Ez dixwazim nivîsa xwe bi hinek replîkên Beynelmîlel biqedînim:

-Gelo sosyalîzm çi ye?

-Sosyalîzm, di wexta hêjîran de hêjîrxwarin e... lê hêjîrxwarina herkesî ye.

Changed with the DEMO VERSION of CAD-KAS PDF-Editor (http://www.cadkas.com).

Seid Abdulkadir



Seid Abdulkadir 1851 yılında Çolemerg(Hakkari) Şemdinli(Şemzinan) doğumlu. Nakşi Şeyhi Şeyh Ubeydullah Nehri'nin oğludur.
1879 yılında çıkan Şemzinan isyanında, Babası ile birlikte ayaklanmayı yönetti. Ayaklanma bastırılınca babası Şeyh Ubeydullah ile birlikte Mekke'ye Taif'e sürgün edildiler. 1908 yılında Meşrutiyetin ilanından sonra Kürt Teavün ve Terakki Cemiyetinin kuruculuğunu yaptı ve başkanlığına getirildi. Ömür boyu bu cemiyetin başkanlığını yaptı. Ayrıca Hürriyet ve İtilaf Fırkasının kuruluşuna katıldı. 1910 yılında Osmanlı Ayan Meclisine atandı. 1918 yılında kurulan Kürt Teali Cemiyetinin kuruluşunda ve başkanlığını yaptı. 1919 yılında Damat Ferit Paşa'nın hükümetinde Şura-i Devlet Reisliğine atandı.
19 Aralı 1919 yılında Kürt asıllı Şerif Paşa ile Ermeni asıllı Boghos Nubar Paşa arasında Paris'te yapılan Barış Konferansına, Fransa gazetelerine verdiği demeç ile destek verdi. Kürt Teali Cemiyeti Başkanı sıfatı ile Kürt Özerk devleti ve benzeri bir statü talebi ile İngiliz temsilcilerle görüşmeler yaptı. Bu görüşmelerin duyulması üzerine Bab-ı Ali'ye davet edilerek bu tür temaslardan uzak durması istendi. 8.12.1919 günü İngiliz İstanbul yüksek komiserliği müsteşarı Tom Hohler ile görüşerek Kürtler ile Ermenilerin Paris'te ve İstanbul'da anlaştıklarını anlattı. Damat Ferit Paşa'nın, Ali Rıza Paşa'nın hükümetinin düşürülmesi karşılığında Kürdistan'a özerklik vaadinde bulunduğunu açıkladı. İngiliz Tom Hohler Şeyh Abdulkadir'in bağımsız Kürdistan hakkında kararlı olduğunu anlatır ve kendisinin bundan çok etkilendiğini söyler.
Kürt Teali Cemiyeti İstanbul Cağaloğlu'da Sıhhat ve İçtımai Muavenet Umum Müdürü Dr. Abdullah Cevdet Bey'in apartmanında Seid Abdulkadir ile arkadaşları 2-Hüseyin Şükrü(Baban)bey, 3-Dr Şükrü Mehmet(Sekban) bey, 4-Muhittin Nami bey, 5-Babanzade Hikmet bey, 6-Aziz bey tarafından kurulmuştur.
1918 eylül ayında kurulan cemiyetin başkanlığına Seid Abdulkadir, yardımcılıklarına Mehmet Ali Bedirhan, Ferit Fuat Paşa, genel sekreterliğe Baban zade Şükrü Bey getirildi.
Osmanlı İmparatorluğunda ilk yasal Kürt örgütü Diyarbakır'da 1908 yılında kurulmuştu. Bu örgütün adı Osmanlı İttihat ve Terakki Cemiyeti kurulmuştu. Aynı yıl İstanbul'da Kürt Teavün ve Terakki Cemiyeti kuruldu. Başkanlığına Seid Abdulkadir getirildi. 1918 yılında İstanbul'da Kürt Teali Cemiyeti, 1919 yılında Kürt Neşr-i Maarif Cemiyeti, aynı yıl Kürt Hevi Cemiyeti ve Kürt Kadınları Teali Cemiyeti,Kürt Milli Fırkası, 1921 yılında Kürdistan Teşrik-i Mesa-i Cemiyeti Kurulmuştu. Seid Abdulkadir'in yakın dostu Palulu Kör Sadi Kürdistan Teşrik-i Mesa-i Cemiyetinin sekreterliğine getirilmişti. Kürt Teali Cemiyetinde yer alan şahsiyetlerden Hicaz Valisi Mustafa Zihni Paşa,eski Harput valisi Kemahlı Sabit, Bediüzzaman Molla Said, Muş valisi İlyas Sami, Kaymakam Abdulaziz, Baban zade Hikmet, Şeyhulislam Hayrizade İbrahim, Mevlana zade Şevki, Çivrili zade Mehmet Nuri, Emin Paşa, Dr Şükrü Mehmet, Kürdistan dergisi baş yazarı Arvasi zade Mehmet Şefik, aynı derginin sorumlu müdürü Mehmet Mihri, Jin dergisi sorumlu müdürü Hamza, Berzenci zade Abdulvahit, Hayrani zade Kemal Fevzi örgütün ileri gelenleridir. Bu yıllarda faaliyet gösteren Kürt Neşr-i Maarif Cemiyeti kurucuları Bedirhan zade Emin Ali Bey, Mithat Bey, Kamil Bey
Seid Abdulkadir, Şemdinlili Şeyh Ubeydullah'ın oğludur.
Peygamber soyundan geldiği söylenen Nakşibendi Şeyh Ubeydullah 1881 yılında önce İran yönetimine, sonra Osmanlı yönetimine karşı ayaklanan müritlerinden oluşan savaşçılarına rağmen, bir din alimi olarak ilk defa Kürdistan kelimesini telafüz etmiştir.
Bu dönemde Kürt hareketindeki gelişmeler hükümeti tedirgin etti. Osmanlı Hükümeti 10.temmuz 1919 günü sadarette hükümet üyeleri adına Haydari zade İbrahim Efendi, Abuk Ahmet, Avni Paşa katıldı. Kürt heyetinin başında Seid Abdulkadir, Emin Mehmet Bedirhan, Mevlana zade Rıfat, Yüzbaşı Emin, Binbaşı Avni Bey katıldılar. Görüşmeler sonunda bir çok ana konu yanında, bölgeye gönderilecek valilerin Seid Abdulkadir tarafından önerilmesi var.
14. ocak 1922 günü bir yurt gezisine katılan Mustafa Kemal 16-17 ocak 1922 günü İzmit Kasrın da gazeteciler ile yaptığı konuşmasında, o gün Kürt Özerkliğine değinmişti. Bu görüşmeye 1987 yılında izin verilince, Mustafa Kemal konuşmasında "Başlı başına bir Kürtlük düşünmekten çok anayasamız gereğince zaten bir çeşit özerklik oluşacaktır. O halde hangi bölgenin halkı Kürt ise onlar kendi kendilerini özerk olarak yöneteceklerdir." 1921 Anayasasının 21. maddesinde Kürtlerin "Manevi kişiliğe ve özerkliğe sahip olacaklarını söylüyordu." Madde şöyle: " İl yönetimi yerel işlerde manevi kişilik sahibidir ve özerktir. Dış ve iç siyaset, dinsel, adli ve askeri işler, uluslar arası ekonomik ilişkiler ve bir çok ili ilgilendiren işler dışında hükümetin önerisi Büyük Millet Meclisi tarafından çıkarılacak yasalar gereğince evkaf, Medreseler, eğitim, sağlık, ekonomi, tarım, bayındırlık, sosyal yardım işlerini düzenlemek il kurullarının yetkisindedir." Denilmektedir.
Seid Abdulkadir, Osmanlı bünyesinde yaşayan halkların demokratik birliğinden yana bir çözümü savunmaktadır. Dönemine göre oldukça liberal görüşlere sahiptir. Babasının isyan döneminde Müslüman olmayanlara dokunulmaması için fetva verdi, Müslüman olmayanların dokunulmaması için evlerine mavi bayrak astırdı.
S eyit Abdulkadir, Şeyh Sait isyanı ile bağlantısı gerekçesi ile 27 mayıs 1925 günü Diyarbakır'da idam edildi. Seid Abdulkadir idam sehpasında şöyle dedi; " Zaten sizler yıkma ve harap etme konusunda büyük bir şöhrete sahipsiniz. Burasını da Kerbelaya çevirdiniz. Şunu biliniz ki dehşet ve insafsızca sömürü ile şan ve şeref kazanılamaz."

Şêx Seyîd

Şêx Seid di sala 1865 de li navçeya Palu yê ji dayik bû. Kalê wî yê Nexşî, Şêx Elî Septî di navenda sedsala 18. De li gundê Amedê yê bi navê Septî koçî Paluyê kirîbû, xwediyê 5 kuranbû ji van yek bavê Şêx Seid, Şêx Mehmûdbû. Piştê Şêx Eli diçe ser dilovaniya xwe bavê Şêxseîyd, ŞêxMehmûd koçî Xinisa Erzurimê dike, li wir jiyana xwe berdewm dike. Şêx Seid, perwerda xwe ya olî li vir bidawî dike.
Serhildana Şêx Seid encameke xebata cemyetên Kurdanbû, Cemyeta bi navê "Azadî" di sala 1923 de diraliyê siyasetmedarên kurdan ve hat damezirandin. Cemiyeteke îlegalbû û bi şêwaza hûcreyê dixebitiya û her hûcreyekê 5 endamên wê hebûn. Endamên wê cemiyetê hevdin bi navên kod nas dikirin, cara ewil serokê wê Albay Xelîlê Cibranî bû...
Şêx Seid di nav civaka xwe de kesekî birû bû, xwedî paye û otorîteyekî bilindbû, lewma endam û rêvebirin cemyeta Azadî xwestin ku wî jî bêxin nav xebata xwe. Li ser vê biryarê ji endamên cemiyetê Yusuf Ziya rêkirin gel şêx Seid, ew çû bi Şêx Seid re hevdîtinek pêkanî û ew îkna kir.
Seroktiya Cemyeta Azadî
Di zivistana 1924 de Pêşengên Kurd li Paluyê civînek pêk anîn, di vê civînê de biryara xurt kirina xebatên bixef derket. Di vê navberê de pêşengên eşîra Xormekiyan, Serokê Hukmata Enqerê, Mistefa kemal, li xebatên cemiyeta Azadî agahdar kirin û xebatên cemiyeta Azadî têvenan. Bi fermanekê Mistefa Kemal, Yusuf Ziya beg û Albay Xelîlê Cibranî derdest dike û ewan dişîne Bedlîsê dada Eskerî. Li ser girtina wan Cemiyeta Azadî rêvebiriya xwe nû dike, Şêx Seid jî bona serokatiya cemiyetê hildibkêre.
Armanca Cemiyeta Azadî ewbû ku di newroza 1925 de dest bi serhildana xwe bikin. Di vê navberê de Şêx Seid diçe aliyê Dêrsimê, ku her çawa dike jî nikare pêşengên Eşîrên Dêrsimê îkna bike. Dema ku li Dêrsimê destevale vedigere, giraniya xwe dide hoz û eşîrên din, di vê arê de gelek piştgiriya gelek eşîran xezenc dike, gelek rêberên oldar bi aliyê xwe dêxe û teva wan camêran ser li bajarokên Licî û Hênê dide.
Şêx Seid, teva sed siwariyên bi çek û beşek ji pêşekên eşîran, di 5 ê Şubata 1925 de li Hênê derdikeve. Tê Pîranê serdana birayê xwe Evdirehîm, li mala wî dibe mêvan. Di heman şevê de Serleşkerekî ku navê wî Husnîbû teva mifrezeyek leşker tê Pîranê û ji Şex Seid deh kurdên ku mehkûmin û li Pîranê dimînin dixweze. Li ser vê yekê dibêje; "Ew kesên ku hûn dibêjin nasê minin, ez li we hêvî dikim, heta ku ez li Pîranême hûn deste wan nedin, piştê ku ez li vir derketim, hûn bi qîma xwe ne, werin ew kesên hûn dibêjin wê demê bibin."
Ûstexmenê bi navê Hûsnû efendî di biryara xwe de diritmîne, di navbera leşker û gundiyan de pêvçûn derdikeve, ji wan leşkeran hindek tên kujtin hindek jî dikevin destê gundiyan. Ew pêvçûna ku li Pîranê derdikeve sekteyê li serhildanê dêxe. Bi rastî Şêx bixwe jî dizanî ku kurd ne amadeyî serhildaneke birêk û pêkin. Lewre Şêx, li Pîranê derket, derbasî Gêncê bû. Dema birayê Şêx Seid Tahîr, bûyerê dibîze, dest dide ser postexaneya Lîcê, roja din yanê 11 yê Sibatê teva sed siwarên ku çek hildayî tê Pîranê, pere û belgeyên ku dest dayî ser dispêre Şêx Seid. Ew herdu bûyerên ne di demê de dibin destpêka serhildanê, Şêx Seid dibe serokê serhildaneka zû destpêkirî... di 14 yê Sibata 1925 de bi 10.000 siwariyên çêkdar dest dide ser Gêncê.
Serokê Eşîra Mistan Feqe Hesen bi pêywîra Qaymeqam vedibuhte navçeyê û bona demekê wê derê li xwe re wekî paytext êlan dike, her kurdekî di riya şoreşê de wekî mucahîd qebûl dike. Serhildana Şêx Seid di demeke kin de li çar bajaran [illegible] Şêx Seid û mirovên wî.
Hêzên girêdayî Şêx Seid di 20 Sibata 1925 de destdan ser Hênê, Erxanî û Lîcê, Bajarokê Paluyê bû qerergaha 20 hezar siwariyê kurd. Şêx Seid li wir, ji hêzên xwe yên Mêrdîn, Erxanî û Madenê agahî distandin. Hêzêeka girêdayî Şêx Seid şeva 11 Adara 1925 an bi çekdarên xwe ên bijarte di Deriyê Mêrdînê re dikevin Amedê. Di heman şevî de ji hêzên Kurdan nêzî 150 çekdar ji jiyana xwe dest berdide, ji hêzê hindek jî dev ji bajêr berdidin vedigerin mala xwe. Şêx Seid bona vegera wan fermaanekê diweşîne, çima ku bajar bi 70 hezar leşkerî hatîbû dorpêç kirin nekarîn vegerin.
Şex Seid teva hêzên bi wî ve girêdayî şûn de vedikêşe, heta Dara Hênê diçin. Li wir ji hev belaw dibin û berbî Gênc, Palû û Çepaxcûrê diçin dewsa xwe didin wenda kirinê. Şêx û hevalên xwe di 27. Adara 1925 de diçin Çapaxçûrê. Ji eşîrên Xarpût û Dêrsimê hindek alikariya Arteşa Tirk dikin, bi vê sedemê çembere li dor Şêxseîd hindekî din teng dibe, Şêx Seid û hevalên xwe piştê demekê vedikşin navçeya Solxanê.
Eşîra Xormekiyan bi 400 siwarên xwe derkete pêşiya Eşîra Cibraniya, teva hêzên arteşê di demeke kin de hêzên Cibraniyan şikestandin. Di vê navberê li hember serhildanê rêvebirên Komarê hindek zagon nû derxistin û hin tedvîrên leşkerî yên nû hilanîn. Li herema serhildanê, yanê li bajarên weke Gênc, Mûş, Erxanî, Dêrsim, Amed, Riha, Siwêreg, Sêêrt, Bêtlis, wan û Colemêrgê siqiyonetim êlan kirin.
Li piştê êlankirina siqiyonetînê Meclîsa Komarê zagona bi navê "Taqrîr-i Sikûn" a meşûr derxistin û qanûn du salan di rê de dimîne. Piştê derketina vê zagonê, Îsmet Paşa zagona Dadên Îstîklalê da pêşa meclîsê û piştê dengdanê dest bi damezirîna ew dadgehên meşûr tê kirin. Du dadgehên Îstîklalê tên damezirandin, ki van yek li Enqerê, ya din li wîlayetên Şerqê ku ew dadgeh xwedî selehiyeteke bêsinor bû. Ji xwe ji piştê demeke kin, hukmatê berpirsiyariya erê kirina biryarên daliqandinê da serleşkeriya li heremê pêywîrdar.
Dema destpêka serhildanê, Generalê bi navê Kemaledîn Sami digot; "Di mijara pirsgirêka kurd de sê pêyvîr li ber hikmatêne, ji van 1) Serhildan bi awayekî tûnd bê dagirkirin, 2) herema kurdan ji çekan bê paqij kirin, 3) Kurd li welatên rojava hindik hindik bên belaw kirin, gelheyeka tirk li welatên kurdan bên binecî kirin.
Ji wê pê ve hikmatê, ew hersê şertên leşkerî kirin zagon û kurd bi wê şêwazê birêve birin. Li ser vê yekê fermandariya arteşê xilatek danî ser serê Şêx Seid û got; "Ger ku kî Şêx Seid bi saxî bine, emê xelateka ku ji 1000 zêr û 8000 lîre pêk tê, ger ku mirî bînin emê xilateka ku ji 7000 zêran pêk tê, ger ku hevalên wî wî bidin dest, emê serê wan wekî xilat bidin wan."
Di avrêla 1925 de bi xiyaneta Qasimê Cibrinî Şêx Seid û 25 hevalên wî li Gênc hatin girtin. Li Amedê di aliyê dada îstîklalê ve hatin darizandin, di encama vê darizandinê de di 29 ê pûşpera 1925 de, biryara daliqandina 47 kurdên ku bi Şêx Seid re serhildabûn hat dayîn û di demeka kin de ew biryar anîne cih. Şêx Seid li ber darve kirina xwe, weke gotinên dawî wiha digot; "Bî tabî, jiyana me bi dawî bû, çima ku min li riya miletê xwe de serê xwe da, ez ne poşmanim, ger ku di pêşerojê de neviyên me, ji armancî dijmin li me fedî nekin bes e. "
Semsûr

Elî Karadogan
Mamoste/nivîskar

BAJARÊ RENGÎN

Semsûr bajerekî dîrokî ye. Şaristaniya Komagene li ser axa Semsûre ava bûye. Pere û Samsate ji şaristanîye re dergûşi kirine. Li ku derê Semsûre bê mêzekirin, mirov şopên şaristaniya dîrokî dibine. Taybetiyeke din a Semsûre jî heye. Li ser axa Semsûre tenê şaristanî ava nebûne. Li ser vê axê cûr be cûr netewe û ol jî jıyane û hîn jî dijîn. Ev gel û ol herdem bi hev re di nav aşitiyê de jiyan e. Taybetiyên vî bajarî ne bi tenê ewin jî, min bi kurtasî ew anîn zimên.

Ji hêla aborî de jî pirsgirêkên Semsûrê hene. Ez ê wan pirsgirêkan di nivîseke din de binivîsim. Eze ê di vê nivîsê de bi taybetî hela olî û netewî bînim zimên. Min di serî de jî gotîbû, li Semsûre cûr be cûr netew dijîn. Li ser axa Semsûrê ; Tirk, Kurd, Ermen, Suryanî, Qereçî, Gewende, û Dom dijîn. Ev gelan li ser vê axê bi çand û hûnerê xwe, xweser dijîn, Gelê Ermen li vir awarte ye. Gelê Ermen bi qir kirinê ji ser vê axê koçber bûne, a niha pir kêm mane û yên mayî jî nikarin serbixwe, bi çand xwe ya otantîk bijîn. Bi gelemperî xwe vedişêrin. Wextê ku li ser Ermeniyan zordestî dibe, bi piranî koçber dibin û vê axê terk dikin. Bapîrên me digotin, wextê ku zordestî li Ermeniyan bû, Kurdan (bi teybetî Kurdên elewî) ew star kirine. Dîsa jî li ser axa Semsûre Ermenî pir kêm mane. Kemasiya wan kemasiya çanda rengînî ye.

Min di temenê xwe de ne dîtiye, ne jî bihîstiye ku di nav van gelan de pevçûn çêbûye. Bi gelenperî van gelan, bi hev re di nav aştî lihevhatineke berfireh de jiyane. Min gelek caran çavdêrî kiriye; wextê eyd û dawetan serdana hevdi dikin. Pir mînak tunebin jî keç dane hev û bûne xinamiyên hev.

Semsûr ji aliyê olî de jî pir rengîn e. Li ser axa Semsûrê misilman û xiristiyan dijîn. Misilman jî di nav xwe de du cure ne. Misilmanên Sunî û Elewî hene. Gelê Sûryanî girêdayî dêra qedîm Sûryani an jî dêra Ortodoks Sûryanî ne. Ermenî jî ji zava(mezhep) katolîk in.
Tê zanîn ku terîqeta Neqşîbendî di nav kurdên misilman de cîhekî pir girîng digire. Menzîl navendeke mezin a terîqeta Neqşîbendî ye. Li vir misilmantîyê fêr dikin û şagirtan digihînin. Şagirtên ku li vir digihên li Tirkiyê belav dibin û Neqşîbendîtiyê didin nasîn. Lê belê bê Neqşîbendiyê terîqetên weke qedrî, rûfaî û whd. jî hene.

Semsûr bajarek ku hejmareke mezin Elewî lê dijîn e. Çawa ku Neqşîbendî terîqateke girîng e ji bo misilmanên sunî; ji bo elewîyan jî ocax hene .Ocaxê Axûçan ji bo elewîyan ocaxeke girîng e. Baskekî wê ocaxê li Semsûre ye. Li wî ocaxî dede hene û rê û rêzên Elewîtiyê didin nasîn. Elewî pir caran pirsgirekên di nav xwe de li wî ocaxî çareser dikin. Her çiqas ku di salên dawî de giringiya xwe winda kiriye jî hîna navendeke girîng e, ji bo Elewiyan. Di salên dawî de Elewî xwe bi komeleyan (Komeleya Çanda Hecî Bektaş, Komeleya Pir Sultan) jî bi rêxistin dikin.

Gelê Sûryanî jî her sal cejna xwe ya bi teybet pîroz dikin. Sûryaniyên ku çûne derveyî welêt her sal di cejna xwe de tên Semsûrê û beşdarî cejnê dibin. Min bi xwe govanî kiriye; yên ku ji derve tên serdana cîranên xwe yên berê, dikin û jiyana berê ku bi hev re dijîn yad dikin. Min ji kalekî Sûryanî gotinek bîhîst û wê gotinê ez pir xemgîn kirim. Gotibû, ***"42 sal in ku min terka axa xwe û welatê xwe kiriye. Lê dîsa jî ez her dem di xewnên xwe de vira dibînim. Ez temenê rojeke vira bi deh salên wira nadim."*** Kengê va gotina tê bîra min, mîna ku tiştek di gewrîya min de bimîne, dibe û ez bêhna min teng dibe.

Hêvîdarim ku ev gel û ol herdem bi hev re, di nav aştiyeke berfireh deî bijîn. Çima ku ez zanim ev rengînî rengîniyeke pir xweş e û taybetiya axa me ye.

Changed with the DEMO VERSION of CAD-KAS PDF-Editor (http://www.cadkas.com).
Changed with the DEMO VERSION of CAD-KAS PDF-Editor (http://www.cadkas.com).
Changed with the DEMO VERSION of CAD-KAS PDF-Editor (http://www.cadkas.com).

JI BIHÛŞTÊN RÛZEMÎN ÊN VEŞARTÎ "CÊLIKAN"



Cêlikan, Wargeha Eşîra Reşiyane,
Xwediyê çiyayên bilind, geliyên kûr,
kaniyên sar û avşirîn e,
Malika hinguv û titûnê ye,
Koziya agît û mêrane,
Bihûşta rûzemîne Cêlikan...

Cêlikan, berê bajarokbû(kasaba) û girêdayî bajarê Meletiyê bû, dema sala 1954 de Semsûr, ji Meletiyê qetiya û bû wilayet, ew jî bû navçe û bi navê "Çelikhan" bi Semsûrê ve hat girêdayîn. Cêlikan li bakûrê Semsûrê dikeve, navbera wê û Semsûrê 56 Km. ye. Navçe, teva 19 gundên xwe war û wargeha Eşîra Reşiyan e, di taximê Eşîra Kawa de cîh digre. Cêlikan, li qûntara başûrojhilatê Torosan Avadan bûye û bi çiyayên bilind û navdar dorpêç bûye. Bilindiya navçeyê ya li behrê 1388 e. Li bakûrê navçeyê Gola Evdilxirawê, li rojavayê wê Çiyayê Rûtikan, li başûrê wê çiyayê herî bilind ku bi navê çiyayê Sipî tê binavkirin û bilindiya wî 2700 metro ye cih digre, li rojavayê wê Çiyayê Melê, bakurojavayê wê jî Çiyayê pîroz, Ulubaba cîh digre. Birastî ku meriv bi wateya pêyvê bibêje, navçe welatê çiyayên bilind, avên sar û geliyên kûr e, hawîrdora wê mêrg, kanî û daristanin.
Li gor hêjmara 2009 an, gelheya Cêlikan teva gund û bajêr ji 15.396 kesan pêk tê, ji van 7.172 kes li navçeyê dijîn. Tevahiya gelheya Cêlikan Kurdin(gundek ne tê de) Sinî û Elawî bihev re dijîn. Mala Pîr(Ocaxê Axûçana) li bajarokê bilamê, taxa Quridere rûdinin. Tevahiya Elewiyên Semsûrê tabî du ocaxanin û ji van herdu ocaxên mezin yek Mala Axûçanan in. Kurdên Cêlikan bi Kurmanciya bakûr diaxîvin. Devoka ku îro li navçe û derdora navçeyê tê axavtin gelek xwerû û arkaîk e. Di aliyê fonetîkê de teybetî heremê ye. Eşîra Cêlikan ku berê tevahî li war û wargehên navçeya Cêlikan binecîbû, di aliyê Dewletî Osmanî de di sedsala 18. De hatiye sirgûn kirin. Sirgûnên eşîrê dîsa di aliyê Dewletî Osmanî ve bi darê zorê li bajarokê Islehiyê tên binecî kirin. Kêm malên eşîrê bi xurtiya xwe dikarin xwe li hember zora dewletê bigrin û di warê xwe de dimînin. Li piştê goç dana Eşîra Cêlikan li aliyê Serhedê hin kurdên koçer tên li warê ku îro jê re Bîstikan tê gotin bicih dibin. Çawa ku tên bi bîst konan li heremê bicih dibin, lewma di aliyê nişteciyên heremê ve ji wan re "bîstkon" tê gotin û navê gûndê Bîstikana moderin jî di wir de tê.
Gelheya îro ku li navçeyê dijî bi hatina Pîrhemzikên Dêrsimî temam dibe. Li piştê fermana koçberiya Eşîra Cêlikan, navçeyê du afetên mezin derbas kirine. ji van yek erdhêja ku di sala 1869 de pêkatî ye. Di vê erdhêjê de gelek mal û xanî û karxane xirabûne û bi sedan kes jiyana xwe ji dest dane. Ya duyemîn şewba ku gel ew bi navê "mitik" binav dikirbû. Di wê nexweşiyê de gelek însan mirine û bi dehan mal û malbat li ber wê nexweşiyê koçber bûne.

Changed with the DEMO VERSION of CAD-KAS PDF-Editor (http://www.cadkas.com).

Çima ku berê vir de navçe, teva derdora xwe warê Eşîra Cêlikan bû, bi wî navî dihat binav kirin. di nav gel de heremê re Cêlikan dihat gotin. Şûna ku navçeya niha lê avadan bûye, gûndekî bi navê "Komşîr"bû, navçe li ser wî gundî şên bûye. Piştê damezirîna komarê (cumhuriyet) navê wî gundî bi şeklê Çelikhan hatiye guherîn.

ABORÎ
Li navçeyê sinayî qase ku mirov bêje tune ye kêm e. Di ew salên dawî de di aliye Ozel Îdareya parêzgeriyê(wîlayet) de tesîseke (damezrawe) ava pakêtan hat damezirandin. Piştê demekê wîlayetê ew tesîs firot şîrketeke taybet. Îro di wê tesîsê de aveka bi navê "Sersu" ku gelek hêjaye tê pakêt kirin û firotin. Li navçeyê tesîsa duyemîn li ser bendava Çatê tesîsa masivaniyê ye. Piştê avhilanîna bendavê di salên 2000 an şûn de di aliyê şîrketeke taybet de tesîseke masî hilberînê li ser ava bendavê hat ava kirin, şîrket di wir de masiyên sore digîne û difroşe bajarên li derdora navçeye.
Gelê navçeyê debara xwe bi çandin û sewalvaniyekê kêm dike. Çima ku ava heremê pir û gelek sar e, titûnekî gelek baş ku aromaya wî taybetî wî ye li heremê tê digihê, gel bi hilberîna wî titûnî debara xwe dike. Her çiqas ku bi qaçaxiya titûnê Eşîra Kawiyan gelek meşûrbe jî, îro titûn bona navçeya Cêlikan dahatiyeke baş e û gelek malbatên Cêlikî debara xwe bi bazirganî û hilberîna titûn dikin. Titûna Cêlikan gelek xweş û navdar e. Li tevahiya Tirkiyê û rojholata navîn titûna navçeyê tê zanîn û pejirandin. kêşandina wî gelek baş e. Ya herî baş ew e ku kêşandina titûna Cêlik û Kawiyan li hawîrdora bazara rojhilata navîn û Tirkiyê tê zanîn. Li navçeyê bilî titûn baxçewaniya fêkiyan û fasîleyên hişk tê kirin. Di fêkiyan de sêv, zerdalî, hinar û huliyên navçeyê navdar û meşûrin. Fasîleyên ku li heremê tên hilberîn jî gelek navdarin û di aliyê bazara Meletî û Semsûrê de tê pejirandin. Piştê ew çend salên dawî gelê navçeyê fetlûmên fistiqa

Changed with the DEMO VERSION of CAD-KAS PDF-Editor (http://www.cadkas.com).

re fistiqên entabê tên gotin jî digihên.
Berê li navçeyê û gûndên wê xalîçeyên ku taybetiyê eşaîriyê radigirtin dihatin çêkirin. Ger hindikbe jî îro li hin gundên wê ew xalîçeyên otantî hê jî tên çêkirin û firotin.
Li navçeyê mêşvanî gelek bipêş ketiye û hilberîna hinguvekî taybetî heremê tê kirin. Ji filoraya heremê nebatek bi navê gûnî heye ku ew giya bi tirkî weke "kewen" tê binav kirin. çima ku aromaya giyayê gûnî çêjeke xweş dide hinguvê heremê hinguvê heremê li bazara Tirkiyê gelek tê pejirandin û bi navê navçeyê ew hinguv bûye marqe. Li navçeyê gelek seyrangehên meşûr û navdar henin ku gelê Semsûrê havînan teva mal û malbatên xwe tên seyranê li ser ew avên hûnik demên xweş derbasdikin. Ji seyrangehên navçeyê yên herî navdar weke yên li jêr in.
Kaniya Mîr,
Ava Avşeriyê,
Ava Zerbanê,
Ava Spî,
Çemê Mestanê,
Çemê Bilamê
Çemê Recewê,
Zozana Jarî
Bendava Çatê.

EŞÎRA CÊLIKAN
Dema meriv qale Cêlikan bike, pêwîste mirov qale eşîra ku navê xwe daye navçeyê jî bike. Di dîrokê de care yekemîn bi niviskî, em di kîtêba Mîrê Betlîsê Şerefxan ya bi navê "Şerefnamê" de rastî navê vê eşîrê tên. Li gor Şerefnameyê derdora sedsala 11. De heta sedsala 14. Eşîr di bin sîwana Mîritiya Botan de xuya dike. Di sedsala 14. De heta sedsala 15. Li derdora Heskîfê, di bin sîwana Mîritiya Heskîfê de xuya dike. Li piştê hilweşîna Mîritiya Heskîfê, eşîr koçî Semsûrê dike, tê li warê ku îro jî bi navê wan tê binav kirin niştecî dibe. Eşîra Cêlikan di belge û lênûskên Osmaniyan de şaxeka ku girêdayî federesyona bi navê Reşiyane derbas dibe. Eşîr, heta nava sedsala 18. Li heremê jiyan dike.

Di sala 1830 de bi fermanekê ,eşîr di aliyê Osmaniyan ve, li heremê tê sirgûn kirin. Bi vê fermanê eşîr li welatê Islehiyê tê niştecî kirin û piştê demeke dirêj, di navbera wan û Tirmanên herema Baraqê de şer û pêvçûn derdikeve. Li ser vê bê aramiyê, hinek ji wan koçî Anatoliya navîn dikin, hindek şûn de vedigerin navçeya Cêlikan, hindek jî li war û wargehên li dora dîlokê binecî dibin.
GIRAVOKÊN SER AvÊ
Berê li Navçeya Cêlikan goleka bi navê Evdilxirawê hebû. Tevahiya wê golê giya, qamûş(leben) û hedimokbû. Taybetiya vê golê ewbû ku ava wê tê diza, çima ku kaniya wê golê, gol bixwebû ava wê di binê wê de lê zêde dibû, dibû çem û diherikî diçû. Li piştê salê 1997 an dewletê bendavek li pêşa wê ava kir û ava wê di bendavê de gîha hev. Di vê navberê de çayirên di binî golê de teva kîtleyê axê derketin ser avê. Li ser ava bendavê bi qasî 40-45 hêjmaran giravokên ku li ser avê ajnê dikin derketin holê. Ji van giravokan ya biçûk 70-100 M2. Ya herî mezin bi qasî sahayeke futbolê mezinbû. Ew rûmetên ku li ser rûzemînê nimûneyê wan gelek kêmin, ewil rêvebirên bajêr û

navçeyê [illegible] wan tevdîr negirtin, gelekên wan bi lêdana bayî hatin û di reşahiyê de rûniştin.
Sitûriya giravokên ser avê 3 metroye û axa wê ya ku gile nahêle ku av derkeve ser rûyê wê. Ji wêye ku giyayê li ser rûyê wan bi ava baranê zindî dimîne, her sal nû ve ajdidin û hêşin dibin. li gor zanyaran pêkhatana wan bihezaran salan dixweze û xirabûna wan malxirabiyeke mezin e. Em jî hêvî dikin ku ew giravokên ku taybetî navçeya Cêlikanin û ne li Tirkiyê ne jî li welatên din hempa û enteşên wan tinenin, rojekê pêş de aliyê dewletêve bên parastin û qorî kirinê.
ZERBAN

Zerban ziyayareteke piroz e û li navçeya Cêlikan, li bajarokê Bilamê ye. Îro navê ziyareta Zerbanê bi jiyana Bilamiyan ve kelijiyaye û bi sedan salin Zerban Bilame, Bilam jî Zerban e. dîroka wê naye zanîn, lê ku mirov wateya Zerbanê li gor wêjeya devkî ya gel, çîrok û efsaneyên ku li ser wê ziyaretê tên gotin binirxîne, dîrokeke gelek dûr û kevn derdikeve ber me. Di baweriyên Kurdên Zîlanî yên kevn de her eşîr, hoz û êlekê xwedawendên wanên parastinê hene. Berê li welatn Kurdên Zîlanî, her robarekê, her avekê, her çiyayekî, her girekî, her deştekê û her daristanekê xwedawendeka/î xwe yê parastinê hebû. Di baweriya Kurdên Zîlanî ya kevn de Xwedawendê Çemê Ferêt Akhelosbû, weke wê li ber zayînê Zel(Jêl), Zêw, Zêz, Zîn Xwedêwendên parastinê yên Kurdên Zîlanîbûn, meriv dikare "Zerbanê" jî di wê çarçoweyê de binirxîne. Îro di roja me de Zerban ziyareta Elawiyên Reşî ye. Di roja me de jî Reşiyên (Reşiyên Elawî) heremê bi bawriyeke bê şik û paqij, bi parastina Zerbanê îman dikin, çima ku hemû efsane û çîrokên di devê gel de, parastina ziyareta bi navê Zerban li xwe re kirine mijar û wate.

Zerban, li Bajarokê Bilamê Aveke, aveka zelal û hûnike, di dera ku tê dizê de gelek sekinî û bê deng e, dema ku ser çiyayan re dadikeve jêr, [illegible] ser Ava Cenderê.

Li hawîrdora Semsûrê kesê ku navdariya ava Zerbanê nebîstî tune. Îro li heremê bi sedan efsane, çîrok û serhatiyên zindî ku di wêjeya devkî ya gel de dijîn û û bi aliyê gel ve tên vegotin henin. Ji van efsaneyan ya herî balkêş efsaneya Zerban û Seydî Hesen bixwe ye.

Tê gotin ku Zerban Keçeke saf û bêguneh, sêwî û berdestbû ye, lê di ber serê wê re herdem şewqeke kesk û nûranî hebûye û ew li xirabî û bûyerên fena parastiye. Zerban gelek bedew û çelengbûye, navdariya çelengiya wê di ser sinorên welat re hilavitiye û bal û hizra desthilatdar û kesên xwedî hêz kişandiye. Rindiya Zerbanê wîsa deng daye ku li gelek derên welatan beg û pêlewan dihatin bilamê, alayişên qerase û bihişmet dikirin.

Dilê Zerbanê li Seydî Hesenbû, Seydî Hesen jî bi eşqeke bêhempa girêdayîyê wê bû, di heman demê de jî kesekî xwandekar û xwedî îlmekî zorbû. Rojekê heştê siwarên har û çavsor, davêjin ser Bilamê ku Zerbanê li begê xwe re birevînin. Dema siwarên çavsor berê xwe berbî mala Zerbanê dikin, Zerban pê dihese û diçe serbanê, serê xwe dike nav çokên xwe, destê xwe li ber Xwedê digere, dibêje;

"Xwedêyo, tu bi dilan zanî, min bike kaniyeke pak û zelal, ku ez neqenc û xiraban re bibi ruhstîn, dema rind û mesûman ji min vexwer, ez ji wan re bibim jiyan. Ku ez bi destên ew hovên bê qirar gemarî nebim." Tê gotin ku xwedê daxweza wê qebûl dike, Zerban teva şewqa li rûyê xwe dibe avekê, tê dizê û av weke lê di ser ew siwariyên neqenc de werdigere, di demeke kin de ew heştê siwar teva serok û serdarên xwe li wê meydanê difetisin û helaq dibin. ku çend siwarî li ber avê xilas dibin jî, ew şewqa li rûyê Zerbanê di ew şeva reş û tarî de dikeve pêyî wan, dibe gurz û pêtên li agir û di jor de ser wana de dibare, ew jî nikarin xwe li ber xezewa Zerbana paqij xilaskin.

Li piştê wê refek siwarî yên din bona tolwergirtina ew heştê siwariyî dîsa davên ser Bilamê. Dema Seydî Hesen şehîd dikin, şewqa Zerbanê ser wan de jî dibe agir û pêtî, ew jî helaq dibin. lê tê gotin ku ew pêtê li agir bi tenê siwariyan dikuje lê hespê wan jî xusarê nabînin, çima ku xezewa Zerbanê bi tenê li ser zalim û nerindan e. Seydî hesen jî Zerban jî li gor efsaneyê ziyaretin. Gelê heremê diçin ber wan qurban û boraqan didin wan, loqmeya xwe dikin û lihev par dikin...

Amedekar Mehmet Oncû
Lekolîner-Folklorzan
Ademan02@gmail.com

KENÊRK

Mehmet Oncû
Lekolîner/Folklorzan
ademan02@gmail.com

LO EHMEDO

Ehmed digot; "Bi xwetirê we, bi xwetirê we herdu çavên min... Ez ji şevên reş û giran ku serxweşiya wan li binî şîşe dayî têm, derewên min tunin. Di beriyeke min de gotinên dijwar, di beriya min a din de şekirê nav xetan, bona zarokan, ez wîsa dijiyam. Lê ez niha li xerîbiyême û xerîbiya we hemûyame. Bi xwetirê we!.. bi xwetirê we herdu çavê min..."

Ew kurikê asê, dengekî ku ji Semsûrê hilatî û li Anatoliyê belawbûyî bû ... Dengê Ehmed ji kaniyên Cêlikan ên avsar û zelal de za, weke rehmeteka serhildêr dilê ketî û binketiyan av dida...

Dengê Ehmed, awazeka asêbû, li dijberê çekên xwînrijan, di ser Çiyayê Sipî re hildavêt û li meydanên bajaran dibû xunaviyeke havînî, dilê karker û xebatkaran yê ku bi derd û qesawetan peritî derman dikir.

Malbata Ehmed ji Semsûrê, navçeya Cêlikan û gundê Bîstikan e. Hê ku Ehmed nehatîbû dinê bavê wî ji gundê xwe derket, çû li bajarê Meletiyê binecî bû. Bavê wî di fabrîkeya mensûcatê de karkerbû, 4 zarokên wî hebûn, di sala 1957 de, bi hatina Ehmed a dinyayê zarokên wî bûn pêncan. Ehmed biçûkê hemû birayanbû. Di nehsaliya wî de bavê wî li wî re tembûrek anî. Ehmed di dibistana seretay de dest bi lêdana tembûrê kirîbû.

Piştê babvê Ehmed ji kar malnişîn dibe, bona jiyaneka hê baş, dev dide riya Stenbolê, teva malbata xwe diçe li ew metropola merivxwur binecî dibe. Ehmed di aliyekî de xwandina xwe ya dibistana navîn berdewam dike, di aliyê din de warê mizûkê de xwe pêşve dibe. Dema lîseyê diqedîne, ew metropala merivxwur, bona wî qad û deriyekî nûye.

Ehmed di bin bandora felsefeya nifşê 68 an de şêwazeke mizûkê ya protest bipêş dixe û di wê rêçê de beste û sitranên xwe diafirîne. Êdî li ew metropola jiyanxwur bi sitranên asê û sirûdên şoreşgerî jiyaneke nû li ser riya wîbû. Çima ku haya wî li dengbêj û dengbêjiyê nebû, ew li metropolê di bin bandora Hosta Rûhî Su da ma. Bixwe jî bandora Hosta Ruhî Su ya li ser mizûka xwe tu caran înkar nekir, lê bi nêrîna wî di mizûka wî de tiştekî kêm hebû, yê ku kêmasiya Ruhî Su temam kirî dîsa Ehmed bixwebû. Di salên li piştê 1980 yan teva hemû welatiyan bona Ehmed jî salên tarî û bizehmetbûn, lê bi wê ve jî Ehmed, di sala 1985 de albûma xwe ya bi navê "Aglama Bebegîm" derxist. Dema ku gelê di bin giraniya cîzmeyên Cunteya 80 yan de pelçiqî, bi vê albûmê dengê wî bîst, sitiranên wî weke dermanê kula li dilê xwe dibîne. Bi vê hilpekînê pirofîla girseya guhdarên Ehmed pêk tê. Êdî Ehmed, dengbêj û dildermankerê xwendewanên zankoyê, xismên girtiyan, çepgirên eşkence dîtî bû.

Ehmed bi besteya helbesta Nevzat Çelîk, ya bi navê "Şefaq Tûrkûsû(strana şevaqê)" di hûnera xwe de gîha qada herî bilind û ji wê pêve girseyê guhdarvanên wî qatî serhev bû. Di demeka kin de Ehmed tarza xwe ya pirotest, bi hemû welatiyên Tirkiyê da qebûl kirin û hêdî hêdî teqlîtkerên wî derketin, riya wî şopandin û bi şêwaza wî besteyên nû pêkanîn.

Hûnermend, di demeke kin de hat asteka wîsa ku mizûka wî di aliyê kesên dîndar û yên dinên ku li pergalê xesar dîtî ve jî hat pejirandin, êdî qaset û CD yên wî di mala her kesî de dihatin dîtin. Meriv dikare bêje ku pergalê çar û neçar destûr da çepgiriya Ehmed. Lê dema ku Ehmed vegeriya ser hişên xwe û bi xwe hesiya, yanê ku alîgiriya ketiyên ketî Kurdan kir, xwediyên pergalê li wî re gotin; "li çepgiriya te re belê. Lê divê tu çepgiriya xwe bi Tirkî bikî, ger ne wîsa be, emê te li ser erdê xwe, li bin ezmanê xwe sirgûn bikin!"

Pergalê şika her tiştî kir, lê şika ku bavê Ehmed ava Cêlikan ya sar û dijwar vexweriye nekir. Ehmed got; "Bavê min ava çiyayê sipî vexwariye, ne mimkûne ku ez li riya xwe vegerim, ez alîgirê ketiyên ketîme, ezê sitranên xwe bi zimanê bavê xwe yê serhişk ku tu cara serê xwe ji we re netewandî jî bibêjim!"

Hê ku pêyva Ehmed, di devê Ehmed de bû, ew pêxas kirin, paniyên wî pozkêr kirin, ew li ser erdê xwe, li bin ezmanê xwe sirgûn kirin. Li ser vê yekê Ehmed bi sitranên sirgûnê terkîwelat bû û çû...

Kula sirgûnê bû penceşêr di ser dilê Ehmed de rûnişt, ew camêrê çavreş, ew çinarê dil bi eş, di 16 yê kewçêra 2000 de bû kevokeka sipî, disa vegeriya ezmanê welatê xwe...

Changed with the DEMO VERSION of CAD-KAS PDF-Editor (http://www.cadkas.com).